Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê
Kurdistan National Congress
Congrès National du Kurdistan

KNK

Rue Jean Stas 41 1060 Bruxelles tel: 00 32 2 647 30 84 fax: 00 32 2 647 68 49
Homepage: www.kongrakurdistan.net ***e-mail:*** kongrakurdistan@gmail.com

ROJEVA KOMBÛNA MEZIN YA KNKyê

[Civata 10. / 23 - 24 Gulan 2010, Bruksel]

Roja Yêkemîn: 23. 05. 2010

Seet :

10 : 00 Vekirin û rêzgirtin

10 : 15 Merasima sûndxwarinê ji bo edamên nû

11 : 00 Axivtina serokê KNKyê

11 : 15 Navbir

11 : 45 Axivtinên li ser bûn û bûyerên sosyal û polîtîk yên li Kurdistanê û cîhanê - I

13 : 00 Firavîn

14 : 00 Axivtinên li ser bûn û bûyerên sosyal û polîtîk yên li Kurdistanê û cîhanê - II

15 : 00 Navbir

15 : 30 Pêşkêşîya rapora xebatê ya Konseya Rêvebir

16 : 00 Riberiz [munaqeşe] û gotûbêja li ser raporê

17 : 00 Kombûnên komisyonan û amadekarîya planên xebata peryoda duyemîn

19: 00 Şîv

Roja Duyemîn: 24. 05. 2010

Seet :

10 : 00 Gotûbêja li ser pirsa yêkitîya neteweyî û rewşa rêxistinîbûna KNKyê û rola wê

11 : 30 Xala serbest

12 : 00 Girtin û firavîn

Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê
Kurdistan National Congress
Congrès National du Kurdistan

Rue Jean Stas 41 1060 Bruxelles tel: 00 32 2 647 30 84 fax: 00 32 2 647 68 49
Homepage: www.kongrakurdistan.net ***e-mail:*** kongrakurdistan@gmail.com

Rapora Konseya Rêvebir ya KNKyê
Ji bo Kombûna Mezin [Civata 10.]
23 – 24 Gulan 2010, Bruksel

Agahdarî:

Ji bo demê ”Kombûna Mezin” di kombûna Konseya Rêvebir ya 3yê meha 11an ya 2009ê da biryar hate standin ku li 19ê Kanûna 2009ê çêbe. Lê paşê ji ber binasên [sebebên] teknîkî û fikira nûkirina avahîyê KNKyê û herweha operasyona Belçîkê ya li ser dem û dezgehên neteweyî û herweha avahîyê KNKyê, kombûn edî bo 23-24ê Gulana 2010ê hate misoger kirin.

Analîza rewşa polîtîk ya cîhanê:

Di pêşhatin û pêşveçûnên polîtîka dinyayê da atmosfereke şithayî tête dîtin. Ev dijwarîye hem di navbeyna ”hêzên mezin yên dinyayê” da, hem jî di navçeyên cuda yên dinyayê da tête dîtin. Di vê rikeberîya di navbeyna ”hêzên mezin” da xwudanbûna ”çeka nukleer” bûye xaleke sereke. Li milekê Dewletên Yêkbûyî yên Amerîkayê [USA] û Yêkitîya Ewrûpayê [EU] ku wekî baskê cîhana rojavayê tête gotin, li milê dî jî herçend wekî baskê rojhilat neyê bi nav kirin jî, lê pozisyonên Ûrisatê [Rûsya] û Çînê beramberî rojavayê kêm zêde paralelî hev in. Koreya Bakur jî li ser baskê Rûsya û Çînê ye. Hindistan wekî xwudana çeka nukleer reftara xwe ya relatîven serbixwe didomîne. Pakistanê jî çeka nukleer heye û ji ber vê yêkê xwe di encam da dide milê ”Rojavayê”, çiku desthilata çeka wê ya nukleer di destê Amerîkayê da ye. Li rojhilatanavîn jî Iran dixwaze bibe ”hêza nukleer”. Ji xwe li rojhilatanêzîk Israîl hêzeke mezin ya nukleer e û çeperekî xurt yê ”cîhana rojavayê” ye. Di baskanê ya ”rojava” û ”rojhilat”ê da problema ”hêza nukleer” li halêhazir bûye girêbend. Koreya Bakur, Çîn û Rûsya teknolojîya nukleer didine Iranê. Di serî da Amerîka û Yêkitîya Ewrûpayê û helbet Israîl dixwazin Iranê ablûka bikin û ji vê ”sewdaya nukleerîye” bidine lêvekirin. Di vê rikeberîya dijwar da ji Amerîkaya Latîn, Venezuela û Kuba destekê didine baskê Rûsya, Çîn, Koreya Bakur û helbet Îranê. Ji dewletên Amerîkaya Latîn Brezîlya jî, ku xwudanê teknolojîya nukleer e, dixwaze pozisyona xwe wekî Hindistanê serbixwe biparêze. Ev çeper girtina di vî warî da xwe li problema gelek aktuel ya pirsa ”nukleer” ya Iranê da jî tête dîtin. Ji ber vê ”hêza nukleer”, zengînîya petrolê ketîye dereceya duyê di rojeva dinyayê da. Ji ber ku, parastina kanên petrolê [bîrên petrolê] jî êdî bi vê hebûna hêza nukleer ve girêdayî ye. Li her du bask û hêzên relatîven [nisbî] serbixwe da jî paradokseke berbiçav tête dîtin. Hêzên mezin yên desthilatdar yên dinyayê, monopola ”hêzbûna bi çeka nukleer” dixwazin di destê wan da be û heke dewletên dixwazin bibine ”hêza nukleer” jî bi timamî di bin kontrola wan da bin. Di vê çeper girtinê da şik têda nîne ku berjewendîyên aborî û nufûza cografî ya stratejîk ya kan û neqlîyata enerjîyê rola bingehîn dileyizin. Li ”rojhilatê” du hezên mezin, Japonya û Awustralya jî mil didine baskên ”rojavayê”. Ji bilî Îranê, li rojhilatanavîn û rojhilatanezîk, dewletên xwudanê kanên petrolê ewlehîya xwe spartine ”cîhana rojavayê” û di serî da jî Amerîkayê.

Di nav vê tabloya têkilav ya cîhanê da krîza li navçeyên giring yên wekî Kafkasya, Rojhilatanavîn û Rojhilatanêzîk problemên navxweyî di dereceya bilind da didomin. Li Kafkasyayê problemên Azerî-Ermenî, herweha Gurcistanê û helbet Çeçenistanê hêj jî bi serekê neketine. Di vê meydana fireh da jî rengên vê baskanêya ”rojava” û ”rojhilat”ê li ser bûn û bûyeran tête dîtin. Rûsya nufûza xwe ya li Kafkasyayê bi destê Amerîkayê ve bernade û berxwedide. Leyiza Amerîkayê ya li ”rojhilatanavîn” Iran xirab dike. Iranê bi çêkirina ”çeka nukleer” qabilîyeta xwe ya manewrayê zêde kirîye ku eve ji bo bizava neteweyî ya Kurd jî tehlîkeyeke mezin e. Tesîra Iranê li Iraq, Sûrîye û Lubnanê bilind e. Bi vê xurtîyê tesîra Iranê li ser pirsa Filistînê jî heye. Iran gelek req dijîtîya Israîlê dike û pirsa Filistînê kilîl dike û bi vê polîtîka xwe li ”rojhilatanêzîk” jî pozisyoneke xurt bi dest ve înaye. Di çeperê Amerîkayê yê li Iraqê da jî Iran roleke asêkarîyê dileyize û planên Amerîkayê têkdide. Amerîka û Yêkitîya Ewrûpayê di nav hewildanên mezinda ne ku rejima Iranê bidine guhorîn anjî pozisyona Iranê bişkênin anjî qet nebe lawaz bikin û Iranê bêtaqet bihêlin. Di vê bi tinê mana Iranê da, Tirkîye çû hawara wê û di problema ”çeka nukleer” da formûlê ”istasyona veguhastina uranyumê” û ”teqesa sotemenîya nukleerî” digel Brezilyayê hilgirte ser xwe. Tirkîye daku digel Iranê cepheyî antî Kurd û Kurdistanê xurt û teqwîye di pirsa ”çeka nukleer” da hevkarîya Iranê kir. Vêca Kurdistan di nîveka navçeyeke hinde aloz da ye û ji çaralî ve di bin fişareke mezin ya dewletên dagîrker û kolonyalîst da ye.

Rewşa Kurdistanê bi giştî:

Plan û peymanên di meydana Kafkasya, Rojhilatanavîn û Rojhilatanêzîk da têne kirin gelek dîrekt tesîrê li pirsa Kurd û Kurdistanê jî dikin. Kurdistan cografyayeke gelek stratejîk e li navçeyê. Xwudanê bahreke mezin ya kana petrolê û gaza binerdî ye û herweha sentral û korîdorekî stratejîk yê neqlîyata enerjîyê ye di navbeyna rojhilat, navçe û rojavayê da. Zengînîya av û deravan jî bihayê Kurdistanê mezintir dike. Ev zengînîye şik têda nîne ku kamên dagîrker û kolonyalîstan radike. Kurdistan bi sê parçeyan ve hêj jî di bin zulmeke nedîtî ya dagîrî û kolonyalîzma Tirkîye, Iran û Sûrîyeyê da ye. Pêşkevtina li parçeyê başûr, xeleka dagîrî û kolonyalîzma klasîk

Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê
Kurdistan National Congress
Congrès National du Kurdistan

KNK

Rue Jean Stas 41 1060 Bruxelles tel: 00 32 2 647 30 84 fax: 00 32 2 647 68 49
Homepage: www.kongrakurdistan.net ***e-mail:*** kongrakurdistan@gmail.com

qismen şkandîye lê hêj jî statûyeke stabîl ya xwe bi xwetî wernegirtîye. Kontrola Bexdayê û nufûza polîtîk ya baskê Ereb didome û rê li ber stabîlîzebûna statûye başûra Kurdistanê digire. Bexdayê hêj statûya federal ya Kurdistanê jî di nav xwe da bi cih nekirîye. Makqanûna Iraqê ya federal bi taybetî di pirsa Kerkûk û navçeyên dî yên Kurdistanê da bi zanahî nayê tetbîq kirin. Ji ber vê yêkê problema Kurd û Kurdistanê li başûr jî bi rengê xwe yê taybetî û ne wekî parçeyên dî jî be didome. Dewletên dorberê, di serî da Tirkîye û herweha Iran û Sûrîye ji milekê ve şiddeta li ser bizava neteweyî di nav xwe da û herwisa bi hev ra di dereceya herî bilind da didomînin. Dewletên Tirkîye, Iran û Sûrîyeyê di nav xwe da gelek bi koordîne dijî bizava neteweyî ya xelkê Kurd hereket dikin. Baskê Ereb yê hukûmeta Bexdayê jî desteke dide wan. Di nav vê çembera fetisandêr ya dagîrkeran da Kurd tinê bi hêza xwe dijî vî cepheyê bêyûm berxwededin. Di serî da Amerîka û Yêkitîya Ewrûpayê normên "azadî û demokrasîyê û mafên mirovî" li goreyî berjewendîyên xwe binpê dikin û mixabin ji nav van dewletên dagîrker û kolonyalîst, destekê didine Tirkîyeyê. Tirkîye wekî koordînatora cepheyê bêyûm yê anti Kurd û Kurdistan, roleke gelek wêranker û birandêr dileyize di şerê dijî xelkê Kurd da. Tirkîye di ablûkakirina Kurdistana Federal da jî roleke koordînatîv dileyize û herweha daku bi referandûmê Kerkûk, Şengal û Xaniqînê nekevin nav tixûbên xwe yên xwezayî li nav Kurdistanê, destekê dide baskê şoven yê Ereb û nahêle ku maddeyê 140 yê makqanûna Iraqa Federal bi cih bêt. Di kilîlbûna pirsa Kurd da Tirkîye rola sereke dileyize û Îran û Sûrîye jî di nav vî cepheyî da xirabkerîya xwe didomînin. Statûya kolonyal û dagîrkerîyê di dereceya herî dijwar da li van hersê dewletan dom dike.

Rewşa Kurd û Kurdistanê li Tirkîyeyê:

Wekî têtе zanîn û herweha di jorî da jî hatîye gotin, dewleta Tirk dijî bizava neteweyî di hemû çeperan da şerê dijî Kurd didomîne. Di warê leşkerî da operasyonên berfireh têne kirin. Operasyonên leşkerî ji erd û esman bi koordîne têne kirin. Bombardumaneke dijwar têtе kirin. Hema berî vê "Kombûna Mezin" sê roja jî, anku 20ê Gulanê [2010] dewleta Tirk dîsa ve dest bi êrişên hewayî kir li ser "Warên Parastinê yên Medyayê". Di warê sivîl da jî hem şiddeta polîsî dom dike, hem jî dewlet mekanîzmaya dadîyê gelek hişk bi kar tîne dijî polîtîkerên Kurd û vê gavê digel çendek şehridaran, nezîkî du hezaran polîtîker hatine girtin û di girtîxaneyê da ne. Dîsa nêzîkî du hezaran zarok û ciwanên Kurd ku dijî erişên dewletê berxwedaneke militanî nîşan dane vê gavê girtî ne. Herweha rêberê KCKyê birêz Ocalan di bin îşkenceyeke piralî û sîstematîk da ye û mafên huqûqî û qanûnî yên heyî jî nadinê û bi her alî asteng dikin û teroreke nedîtî ya dewletî lê dikin. Dewlet û bi navê dewletê jî hukûmeta AKPyê bi çu newlî xwe nêzîkî diyaloga digel bizava neteweyî ya Kurd nakin. Bi têkoşîna di pêşengîya PKKyê û gerîlla û hemû dînamîkên neteweyî da dewlet mecbûr maye hindek gavan di warê serbestkirina weşana radyo, televizyon û weşangerîya pirtûk û rojnameyan da biavêje. Vê gavê televizyoneke bi Kurdî ku bîst û çar seet weşanê dike heye. Lê belê, ev televizyone dengê dewleta dagîrker û kolonyalîst e û bi Kurdî şerê Kurdan dike. Hukûmeta AKPyê polîtîka Beasa Iraqa kevin ya di warê zimanê Kurdî da, hem jî piştî hilweşîna wê rejima xwûnxwar û îdama Seddamê dîktator, di roja îro da wekî gaveke nûbûna polîtîka li ser Kurdan bi nav dike. Ev tiştên hatine kirin helbet ne bexş û hîmmeta dewleta Tirk in û bi hêz û şiyana bizava neteweyî hatine kirin. Lê belê, îro daxwaza Kurdan ne serbestkirina axivtina Kurdî ye. Ew xwastek li goreyî têkoşîna îro êdî li paş maye. Daxwaza Kurdan ya îro fermîkirina zimanê Kurdî ye û di nav hemû dem û dezgehên dewletê da Kurdî li tenişta Tirkî zimanê Kurdî bibe zimanê duyê yê fermî yê dewletê û herweha Kurdî di nav sîstemê perwerdeye da ji bexçeyê zarokan heta unîversîteyê bête bi kar înan. Dewlet di vî warî da şekala xwe ya kevnare dixuşikîne û naxwaze gavan biavêje. Dewleta Tirk bi israr dixwaze mafên Kurdan di çarçoveya mafên ferdî da teng bihêle û muameleya Laz û Çerkezan bi Kurdan û Kurdî bike ku ew muameleya li Laz û Çerkezan têtе kirin jî muameleyeke dijî mirovî ye. Dewleta Tirk dixwaze bi van polîtîk û gavên lêhbok xwe ji Kurdan xilas bike. Di van hewildanên AKPyê yên guhorînên makqanûnê da jî çu tiştên ku jîyana Kurdan û zimanê Kurdî xweş bikin, rê li ber mafan vekin nînin. Li ber vê rastîyê Kurd mecbûr in ku pozisyoneke xurt û maqûl nîşan bidin beramberî vê hewildana guhorîna makqanûnê. Kurd divêt alternatîva "boykot"ê di nav xwe da gotûbêj bikin û bigihin biryareke xurt.

Di encam da, rewşa Kurdan di nav tixûbên Tirkîyeyê da ji alîyê berxwedan û têkoşîna piralî ve xurt e û cihê hêvîyê ye. Navçeyeke fireh ya şehridarîyan di destê Kurdan da ne. Di parlementa Tirkîyeyê da gurûbeke biçûk lê dînamîk ya Kurdan heye. Pozisyona polîtîk ya Kurdan li Tirkîyeyê di pêşengîya KCKyê da xurt û saxlem e. Temsîla piranîya maqûl ya neteweyî dike beramberî dewleta Tirk. KCK herweha temsîla opozisyoneke dînamik û radîkal jî dike beramberî dewleta Tirk. Bizava neteweyî ya Kurd, ji ber vê rewşa xurt ji bo hêzên demokratîk û radîkal yên xelkê Tirk jî destekeke mezin e li Tirkîyeyê. Bi vî rengî bizava neteweyî ya xelkê Kurd û wekî hêza pêşeng jî KCK adeta pêşengîya bizava demokrasîye jî dike li Tirkîyeyê. Dewleta Tirk û hukûmeta AKPyê ji ber vê rastîya bizava neteweyî ya xelkê Kurd, ji ber vê hêza organîze ya neteweyî, ji ber pêşengîya radîkal û milîtan ya KCKyê diwaze her bi çi rengî be, li nav Kurdan têkvedanê pêkbînin, hêza organîze ya Kurd jar û lawaz bikin û di meydana polîtîk da tesfîye bikin. Li alîyê dî dewleta Tirk xirabkirina demografîya Kurdistanê jî didomîne û daku bigihe vê daxwaza xwe ya nemirovî dest bi çêkirina barajan kirîye ku sedan gund, bajêrk û mezrayan di bin avê da bihêle û nufûsa Kurd bide koç kirin. Dewleta Tirk û bi navê dewletê jî hukûmeta AKPyê nihe ev rola bêyûm hilgirtîye ser xwe û

Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê
Kurdistan National Congress
Congrès National du Kurdistan

KNK

Rue Jean Stas 41 1060 Bruxelles tel: 00 32 2 647 30 84 fax: 00 32 2 647 68 49
Homepage: www.kongrakurdistan.net ***e-mail:*** kongrakurdistan@gmail.com

dixwazin hemû polîtîkên ku zerarê digihînin xelkê Kurd û Kurdistanê realîze bikin. Lê belê, cihê şahîyê ye ku xelkê me ji alîyê şuûra neteweyî ve hişyar e û pêşengîya îro jî politîkeke maqûl ya neteweyi di rê dibe û entrîka û dek û dolabên dewleta Tirk û hukûmeta AKPyê vala derdêxin. Di halêhazir da Kurd di çeperên têkoşîna leşkerî, sivîl û demokratîk da serkevtî ne û esasen bêhuzûrî û telaşa dewleta Tirk û hukûmeta AKPyê jî ji ber vê yêkê ye. KNKyê di vî demê borî da destekeke aktîv da bizava neteweyî ya li bakur û daîm banga tifaqa navxweyî bilind kir dijî dewleta Tirk. KNK di têkoşîna li bakur da bi hêvî ye, lê dîsa ve hişyardarîya xwe didomîne û banga xwe berdewam dike ku hêzên neteweyî, pêşengîya polîtîk û leşkerî li beramberî hîlebazîya dewleta Tirk û hukûmeta AKPyê, li xwe, li bizava neteweyî û li destkevtên şoreşê gelek hişyar bin û têkoşîna neteweyî di zemîne herî xurt yê tifaqa navxweyî da bidomînin.

Xelkê me bi pêşengîya bizava neteweyî ya Kurdî îro hejmareke bilind ya şehridarîyan bi dest ve înaye û li navçeyeke fireh ya Kurdistanê ji alîyê îdareya xizmetguzarîya şehridarîyê ve xwudan desthilat e. Vê destkevtê zemînê "otonomîya kulturî û îdarî" qismen jî be derêxistîye meydanê. KNK vê hebûnê giring dibîne û bangî rêvebirîya polîtîk ya li bakur dike ku di parastina vî zemînî da hişyardarî û biryardarîyeke bilind ya neteweyî nîşan bidin û herweha xizmetguzarîyeke bi kalîte bidine xelkê me ku planên paşvegirtina dewleta Tirk ya van navçeyan pêkneyê.

KNK di wê bawerîyê da ye ku xelkê Kurd jî vê rastîyê dibîne û bi hissîyata bilind ya neteweyî destekê dide pêşengîya xwe ya polîtîk û leşkerî.

KNK herwisa hêvî û daxwaz dike ku timamî dînamîkên neteweyî yên jînde yên li bakur û Tirkîyeyê hevgirtineke cepheyî pêkbînin û beramberî dewleta Tirk û hukûmeta AKPyê pozisyoneke bilind ya neteweyî werbigirin û vê yêkê nîşanî yar û neyaran bidin. KNK herweha bangî hemû dewletan jî dike ku li beramberî kir û kiryarên dewletên dagîrkerên Kurdistanê bêdeng nemînin û destekê bidine xelkê Kurd û hemû xelkên Kurdistanê.

Rewşa Kurd û Kurdistanê li Iranê:

Dewleta Iranê di van salên dawîyê da êrişkarîya xwe ya li ser bizava neteweyî ya xelke Kurd bi rengê dewleta Tirk didomîne. Polîtîkeke kopîya dewleta Tirk di pratîkê da di rê dibe. Ji milekê ve hêzên çekdar yên cehşan organîze dike, li milê dî bi hêza xwe ya hewayî Kurdistanê bombarduman dike, ji reşahî ve jî operasyonên xwe didomîne. Herwisa şiddeteke polîsî û pasdarî jî li nav bajêran pêktîne û bi sedan têkoşerên ku xebata sivîl û demokratîk dikin digirin û diavêjin hefsê. Van du salên dawîyê jî dest bi îdaman kirîye û heta nihe nêzîkî deh milîtanên PJAKê û herwisa nêziki pênc têkoşerên bizavên dî yên Kurdî hatine îdam kirin. Di kiryara herî dawîyê da jî pênc aktîvîstên xebata polîtîk îdam kirin û 5 gerîllayên HRKyê jî bi destê cehşan jahrî dan. Iran polîtîka xwe ya tradisyonel bi israr didomîne. Sine û dorber wekî "Istanê Kurdistan" bi nav kirine û Kurdî di bazarê da serbest e. Iran vê wekî çareserîya pirsa Kurd nîşan dide. Perwerdeya bi Kurdî nîne. Polîtîka bi navê Kurd û Kurdistanê qedexe ye. Rêxistinên ku doza Kurd û Kurdistanê dikin pêkve hatine qedexe kirin. Rejima Islamî ya Iranê piştî ku çêkirina çeka "nukleer" aktuel kir, şiddeta dijî opozisyona navxweyî derêxistîye dereceya herî bilind. Di berxwedana dijî rejimê da jî opozisyona herî li ser xwe, herî organîze û herî milîtan, têkoşîna Kurdan e. Lewma jî şiddeta herî dijwar li ser Kurdan bi kar tîne. Vê gavê dest pê kirîye bajêrên Kurdistanê ablûka dike û şiddeteke komî bi kar tîne. Bi vê şiddetê hem dixwaze bizava neteweyî bişkêne, hem jî bi rêya vê şiddeta li Kurdistanê çavê opozisyona Faris, Azerî û xelkên dî yên Iranê jî bitirsîne û rê li ber têkoşîna opozisyona giştî bibire. Beramberî vê êrişkarîya dewleta Iranê bi navê xelkê Kurd PJAK û rêxistinên dî yên Kurd têkoşîne didin. Bi taybetî hêza gerîlla ya HRKyê ku girêdayî pêşengîya PJAKê ye, çeperên dewletê dide zorê. KNK di vê têkoşînê da destekê dide hemû hêzên neteweyî. PJAK ji xwe endama KNKyê ye. KNK hêvî dike di çeperê dijî dewleta Iranê da, li çeperê rojhilat, di serî da PJAK û hemû hêzên politîk û rêxistinên dî yên neteweyî, di cepheyekî berfireh yê neteweyî da tifaqeke xurt pêkbînin. KNK ji bo pêkînaneke cepheyekî berfireh li rojhilatê amade ye ku hevkarîyê bike. KNK herwisa di navbeyna cepheyê neteweyî yê Kurdistanê û bizava demokratîk ya giştî Iranê da jî vehunandineke cepheyî hewce dibîne. Di nav opozisyona giştî ya Iranê da vê rola pêşeng tinê bizava neteweyî ya Kurd dikare bileyize û di warê pêkînana cepheyekî demokratîk li Iranê da hevkarîya xelkên Iranê bike.

Kurdistana Federal:

Kurdistana Federal, îro realîteyeke Iraqa Federal, rojhilatanavîn û dinyayê ye. Kurd li ser axa xwe xwudan desthilat in û îdareyeke xweserî pêkînan e û di rê dibin. Kurdistana Federal digel hebûna xwe, pirsgirêkên navxweyî û yên bi Bexdayê ra jî hene. Di serî da pirsa bi cih înana makqanûna Iraqa Federal û maddeyê 140 hêj jî pêknehatîye. Kerkûk, Xaniqîn, Şengal û dorberê wan ji ber vê pirsgirêka digel Bexdayê li derveyî tixûbên îdareya Kurdistana Federal mane û eve pirseke gelek giring û giran e. Kerkûk bi serê xwe merkezeke stratejîk e û kana petrolê ye û ji alîyê dîrokî ve jî axa Kurdistanê ye. Xaniqîn jî ji alîyê petrolê ve zengîn e. Şengal û dorberê Mûsil jî cih û warê Kurdan yê hizar salî ye û Ereb destan jê nakêşin. Helbet Tirkîye, Îran û Sûrîye jî daxilî vê polîtîka şovenîzma Erebî dibin û nahêlin ku ev merkezên giring û zengînê petrolê bikevine nav tixûbên xwe yên xwezayî

Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê
Kurdistan National Congress
Congrès National du Kurdistan

KNK

Rue Jean Stas 41 1060 Bruxelles tel: 00 32 2 647 30 84 fax: 00 32 2 647 68 49
Homepage: www.kongrakurdistan.net ***e-mail:*** kongrakurdistan@gmail.com

yên Kurdistanê. Di vî warî da astengîyeke navçeyî ya navdewletî heye. Bexda, Şam, Tehran û bi taybetî jî Ankara hizar astengîyan derdêxin û provakasyonan dikin ku maddeyê 140 yê makqanûna Iraqa Federal di pratîkê da neyête bi cih înan û referandûm çênebe. Lê herwisa rêvebirîya polîtîk ya Kurdistana Federal jî ji alîyê stratejîk ve şaşî kirine û hêj jî kêmasîya ji navxweyî derdikeve serûber nakin. Di serî da yêkitîyeke berfireh ya Kurdistanî nehate vehûnandin di bi taybetî pirsa Kerkûkê da. Heke ev kartê tifaqa navxweyî ji alîyê rêvebirîya polîtîk ya Kurdistana Federal ve bi rêkûpêkî hatiba pêkînan, paytextên dagîrker yên Kurdistanê bi giştî nedikarîn ewqas bi rehetî rê li ber Kurdan birîban. Kurdistana Federal bi vê kêmasîya navxweyî destê xwe li beramberî Bexdayê û paytextên dorberê zeîf kir. KNKyê di vî warî da gelek hewildan kirin ku qet nebe di pirsa Kerkûkê da tifaqeke xurt ya navxweyî pêkbêt û ji bo vê yêkê "Konferanseke Yêkitîya Neteweyî" bête organîze kirin, lê mixabin heta nihe jî rêvebirîya polîtîk ya Kurdistana Federal gaveke erênî neavêtîye. KNK di wê bawerîyê da ye ku dem hêj ne dereng e û rêvebirîya Kurdistana Federal dîsa ve dikare gaveke maqûl biavêje ji bo pêkînana tifaqa navxweyî. Ji bo hewildaneke bi vî rengî KNK amade ye ku hevkarîya rêvebirîya Kurdistana Federal bike. Ji xwe buroya KNKyê ya li Hewlerê di nav têkilîyeke germ da ye.

KNK herwisa hêvî û bawer dike ku rêvebirîya Kurdistana Federal beramberî kêmanîyên etnîk û dînî yên li Kurdistana Federal, dê polîtîk û pratîkeke demokratîktir pêkbîne. Dîsa KNK hêvî û daxwaz dike ku rêvebirîya polîtîk ya Kurdistana Federal beramberî bombardumanên Tirkîye û Iranê jî reaksiyona xwe ya neteweyî nîşan bide. KNK hewildan û xebatên hindek "terîqatên" Tirk yên ku bi navê "perwerdeyê" mîsyonerîya nijadperestîya Tirkî dikin jî divêt hişyar be û rê li ber wan bigire.

Rewşa Kurd û Kurdistanê li Sûrîyeyê:

Sûrîye jî ev demekî dirêj e ku polîtîka kevnare ya dewleta Tirk ya antî Kurd û Kurdistan, li nav tixûbên xwe li ser Kurdan di rê dibe. Piştî derketina rêberê KCKyê Ocalan ji Sûrîyeyê, reftara dewleta Surîyeyê beramberî Kurdan û rêxistinên wan gelek dijwar û bi şiddet bû. Bişar Esad jî vê polîtîka şiddetê didomîne. Hetta zêdetir û vegeryaye polîtîka salên 1960an ku "Kemera Erebî" li ser korîdorê Çiyayê Kurmanc [Efrîn] heta Kobanî û Serêkanîyê jî. Ji alîyê Dêrezorê ve jî ber bi deşta Hesekî û Qamişloyê Ereban bi cih dikin. Qanûnên nû derêxistine ku kirîn firotina mal û milkî ya Kurdan qedexe kirine û herwisa çandinîya li ser erd û zevîyên wan jî qedexe kirine. Bi hizaran Kurd hêj jî bêyî nasname ne û dewlet çu imkanên fermî nade vê nufûsa mezin ya Kurd. Axivtina Kurdî li bazarê hebe jî li dem û dezgehên fermî hatîye qedexe kirin. Bi çu newlî rê nadin ku perwerdeya bi Kurdî di nav sîstemê fermî da cih bigire. Weşangerîya Kurdî bi asteng e. Polîtika legal ya Kurdî herwisa qedexe ye. Dewleta Sûrîyeyê digel Tirkîyeyê di nav têkilîyeke xurt da ye û di nav cepheyê "sêqolî" [Tirkîye – Îran – Sûrîye] yê antî Kurd û Kurdistan da aktîv e. Ji rêxistinên Kurdên rojavayê PYD endama KNKyê ye û li beramberî polîtîkên antî demokratîk û şovenîst yên dewleta Sûrîyeyê xebat û têkoşîneke xurt dide. Ji bilî PYDyê jî rêxistinên neteweyî hene. KNK modelê cephegirîya parçeyên Kurdistanê ji bo "Rojavayê" jî pêşniyar dike. Ji bo pêkhatineke cepheyekî berfireh li rojavayê KNK çi hewce be amade ye ku bike.

Kurd li dîasporayê

Nufûseke boş ya Kurd li meydanên cuda yên dîasporayê dijî. Merkezên mezin yên dîasporaya Kurd li bajêrên mezin yên dewletên dagîrker pêkhatîye. Îro dîasporaya mezin ya Kurd li Stanbolê, li Izmîr, Konya, Mersîn, Adana, Ankara û bajêrên dî yên Tirkîyeyê ye. Dewleta Tirk li van deran dest pê kirîye êrişkarîyên lînckirinê jî pêktîne li ser Kurdan. KNK giring dibîne ku Kurdên dîasporaya Tirkîyeyê hem beramberî van lînckirina bêdeng nemînin, hem jî rêya vegera welatê xwe jî bidine ber xwe. Tehran, Bexda û Şam jî merkezên mezin yên dîasporaya Kurd in. Herweha li Kafkasya û Rûsyayê jî kolonîyeke mezin ya Kurd heye. Li welatên rojhilatanêzîk yên wekî Lubnan,Urdun û Israîl jî nufûseke zêde Kurd lê dijîn. Yêk ji meydanên mezin yên dîasporaya Kurd jî cografyaya Yêkitîya Ewrûpayê [YE] ye. Dîasporaya Kurd ya li nav welatên dagîrker û kolonyalîst, dîrekt bi bizava neteweyî ya welat ve girêdayî di nav xebat û têkoşîneke mezin da ne. Dîasporaya Kurd ya li YEyê jî paralelî bizava neteweyî ya nav welat gelek organîze, aktîv, dînamîk û milîtan e. Kurdên dîasporayê di gelek waran da xebatên demokratîk û sivîl, ji yên nav welatî relatîven jî be bi imkantir dikin. Lê belê, gelek caran welatên Ewrûpayê jî li goreyî berjewendîyên xwe yên aborî û polîtîk şiddeta polîsî û girtinan dikin û xebata Kurdan asteng dikin. Nimûneya dawîyê ya li Belçîkê bû ku KNK jî bi ber vê xezeba wan ket. Lê her bi çi rengî be Kurd li vê meydana fireh ya YEyê xebatên xwe yên demokratîk bi rengekî organîze û dînamîk dikin û ber bi pêş têxin. KNK jî di nav vê xebata meydana dîasporaya YEyê da aktîv e û bi taybetî di warê têkilîyên dîplomatîk û herweha ziman û kulturî da xebatên pêdivî, balkêş û berwer pêktîne. Yêk ji merkezên dîasporaya Kurd ya Amerîkayê, Kanadayê jî xebatên neteweyî vê gavê lawaz jî bin hene. Kurdên dîasporaya Kafkasya û Rûsyayê ji berê were di warê ziman, kultur, folklor, edebiyat û weşangerîyê da xebatên berbiçav dikin. Herçend ji dewrê berê yê "Sovyetan" kêmtir jî bûne, lê dîsa ve xebatek û dînamizmek tête dîtin. Kêm jî be kolonîyeke biçûk ya Kurd li Awustralya jî heye û li goreyî şiyan û imkanên xwe xebateke dikin. KNKyê li wê derê jî endam hene.

Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê
Kurdistan National Congress
Congrès National du Kurdistan

KNK

Rue Jean Stas 41 1060 Bruxelles tel: 00 32 2 647 30 84 fax: 00 32 2 647 68 49
Homepage: www.kongrakurdistan.net ***e-mail:*** kongrakurdistan@gmail.com

Rewşa û pozisyona KNKyê

KNK şik têda nîne ku rêxistineke sihwane ya neteweyî ye û hema bi vê terkîba xwe ya heyî relatîven jî be temsîla piranîyeke maqûl dike li seranserê Kurdistanê. Lê digel hindê jî me ji serî were xwastîye ku terkîba KNKyê firehtir be û hejmara endamên partî, rêxistin û kesên serbixwe zêdetir be. Lê belê, mixabin ku şertên îro yên polîtîk yên Kurdistanê rê nade vê yêkê. Statûya kolonyal ya Kurdistanê jî bi serê xwe asteng e, lê astenga esasî zeîfîya bîr û hizira yêkgirtina neteweyî ya di cîhana polîtîk ya Kurdî da ye. Tengbînî û "ez merkezî"ya hakimî rêxistinên polîtîk zemînê hevgirtina fireh ya neteweyî asê dike. Herwisa "parçegirî" anku "lokalîzm" jî tesîreke negatîv dike li ser bîr û hizirên polîtîker û rêxistinan û eve jî dibe astengek. Digel vê realîteya polîtîk jî, KNK hewildanên xwe yên firehbûna zemînê xwe yê neteweyî didomîne û divêt bidomîne jî. Bi vê daxwaz û amancê salê qet nebe du caran seradanîya Kurdistana Federal tête kirin. Di seradanîyên Kurdistana Federal da carina imkan peyda dibe ji bilî rêvebirên polîtîk û demokratik yên Kurdistana Federal, digel temsîlkarên polîtîk yên parçeyên di yên Kurdistanê jî hevdîtin pêktên û ev rojeva giring ya polîtîka Kurdistanê digel wan tête axivtin û gotûbêj kirin. Pozisyona KNKyê çeperê neteweyî yê herî fireh yê Kurdistanê ye. Amanca KNKyê ew e ku tifaqa herî fireh ya Kurd û Kurdistanî pêkbîne. KNK dê van pêrabûnên xwe bidomîne. Kêm û kasîyên di xebata pratîk da têne pêş jî ji derveyî îradeya KNKyê rûdidin. KNK heta ku hevgirtineke organîze ya neteweyî pêktêt, dê têkilîyên avakirina diyaloga navxweyî bi berpirsiyarî bidomîne. KNK heta ku yêkitîya mezin ya neteweyî pêktêt, li pêkînan zemînê diyaloga neteweyî digere û di vî warî da pêşkevtinên berbiçav jî hene.

KNK di warê dîplomasîya navneteweyî da, di warê ziman û kultura neteweyî da, di warê pêdivîyên dî yên bi giştî neteweyî da perspektîv û polîtîka neteweyî amade dike û pêşkêşî bîr û rehîya neteweyî dike ku rêxistin û kesên bi karê doza neteweyî ve rabûyî van polîtîk û perspektîvên neteweyî di pratîkê da bi cih bînin.

KNK di peryoda duyemîn ya xebata xwe da, li ber nêrîn û pêşniyarên we dê bi plan û programeke rêkûpêktir kar bike.

Bi rengekî kronolojîk karên KNKyê yên hatine kirin:

- Li meha 23-24ê Çileya 2009ê "Konferansa li Parlementa EUyê ya li ser Kurda" çêbû
- Li 24ê Çileya 2009ê sempozyuma li ser "Komara Mahabadê" li Kopenhagê hate kirin
- Li Adar û Nîsana 2009ê rêze kombûnên digel ronakbîr û polîtîkerên serbixwe hatin kirin
- Li Nîsan û Gulana 2009ê seradanîya Kurdistana Federal hate kirin
- Li 14-15-16ê Gulana 2009ê Cejna Zimanê Kurdî wekî sê roj hate pîroz kirin
- Li 24ê Gulana 2009ê dehemîn salvegera damezrandina KNKyê hate pîroz kirin
- Li 4-5ê Teşrîn-Mijdara 2009ê li Brukselê li Parlementa Flaman "Şûraya Ziman û Perwerdeya Kurdî" kom bû
- Li Çile-Sibat 2010ê seradanîya Kurdistana Federal hate kirin
- Li 3-4ê Sibata 2010ê Konferansa Kurda li Parlementa Yêkitîya Ewrûpayê hate kirin
- Dijî operasyona li Adara 2010ê ya li Brukselê nerazîbûnên cuda hatin nîşan dan
- Li meha Nîsan û Gulana 2010ê li gelek bajêrên Ewrûpayê kombûnên bi ronakbîran ra hatin kirin
- KNKyê bi pîrozbahîya li ser "Cejna Zimanê Kurdî", ya li 14-15-16e Gulana 2010ê, li seranserê Kurdistanê û dîasporayê da dest pê kirin
- KNKyê beramberî hemû kir û kiryarên antî demokratîk yên li Kurdistanê xebatên înformatîv û dîplomatîk kirin di qada navneteweyî da

Xebata peryoda ewil û komisyon:

Komisyonên me yên "karê derve" û "ziman û perwerdeyê" di çarçoveya xebata xwe da aktîv bûne û planê xebata xwe pêkînane û kêm zêde bi cih înane û raporên xwe jî dane û hatine "erêkirin". Lê mixabin "komisyona jinan" û "komîteya karê neteweyî" û "komîteya çapemenîyê" her çend karê xwe plan kiribin jî, lê raporên xwe negihandin konseya rêvebir. Konseya Rêvebir vê kêmasîyê tesbît dike û hêvî dike ku di peryoda duyê da ev komisyon û komîte jî aktîv bin û planên xwe yên xebatê realîze bikin û raporên xwe amade bikin.

Bi van bîr û hiziran em silava li we hemûyan dikin û di van du rojên "Kombûna Mezin" da jî daxwaza serkevtinê bo we dikin.Em hêvî û bawer dikin ku "Kombûna Mezin ya KNKyê" dê serkevtî derbaz bibe û mesajeke xurt ya hêvîyê û bi xwe bawerbûnê dê bide xelkê Kurd û Kurdistanê.

Digel rêz û silavên me yên germ.

Konseya Rêvebir ya KNKyê
22.05. 2010, Bruksel

Not:Raporên komisyon, komîte û delegasyonan jî dê di dosyayê da cih bigirin.

Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê
Kurdistan National Congress
Congrès National du Kurdistan

KNK

Rue Jean Stas 41 1060 Bruxelles tel: 00 32 2 647 30 84 fax: 00 32 2 647 68 49
Homepage: www.kongrakurdistan.net ***e-mail:*** kongrakurdistan@gmail.com

Rapora Komîsyona Karê Derve
Ji bo Kombûna Mezin [Civata 10.]
23 – 24 Gulan 2010, Bruksel

Rêxistinên me yên karê derve ku ji alê Komîsyona Karê Derve têne koordînekirin, ji Bûroya Navendî, 4 bûroyên welatan (Fransa, Îtalya, Îngîltere û Swîsre), beşê karê derve yê Hereketa Jinan, Înîsîyatîfa Navnetewî ya Azadîya Abdullah Öcalan, Bûroya Xebata Demokratîk, beşê karê derve yê YXK ê, komîsyonên karê derve yên Meclisên Gel, beşê karê derve yên Partîyên endamên KNK ê, beşê karê derve yên Konfederasyon û Federasyonan pêktê. Ev xebatên me li her welatî dî nav hev de têne koordîne kirin. Di nav koordînasyonên welatan de hinek şexsîyetên serbixwe jî, cihê xwe digrin.

Di nava sala derbazbûyî de, xebatên me yên karê derve weke tê xwestin nehatin meşandin. Kêmahî hinek ji alê me ne, hinek jî ji derveyî mene. Me weke rêveberîya komîsyonê bi rêk û pêk hevalên endamên endamên komîsyonê û koordînasyonên welatan, weke tê xwestin tevlî kar nekirin û xebat daneynî ber wan. Li alê din hinek endamên me ketin nava kar, lê hinek endaman berpirsyar xwe ne anîn cî. Ev pirsgirêkên me, hîn jî berdewamin, divê bêne çareserkirin.

Piştî civîna giştî ya KNK ê, komîsyona karê derve di 08.02.2009 an de kombû û ji xwe re plansazîyek çêkir. Lê piştî meh û nîv din, serokê komîsyonê û cîgirê wî, li Îspanya hatin girtin. Paşê hatin berdan, lêbelê mecbûr man demeke dirêj li wê derê bimînin.

Di navbera 24-29 ê meha Tebaxê de, bi tevlîbûna 55 hevalan perwerde û civîn hate çêkirin. Vê demêde ji ber ku serokê komîsyonê ji bo karek din hate hilbijartin, serokatîya komîsyonê hate guhertin. Piştî wê, li gel hinek kêmahîyan jî be, kar hate meşandin. Di rojên 06-08 ê Sibata 2010 an de bi tevlîbûna 37 hevalan civînek hate çêkirin û plansaziyek berfireh hate amadekirin. Di vê civînê de bi navê Konsepta Karê Derve, belgeyek hate pêşkêşkirin û piştî nîqaşan hate pejirandîn. Hêdî wê karê mey ê derve gora vê konseptê bê meşandin. Tam me digoht emê karekî baştir bikin, piştî sê hefteyan operasyonek berfireh li dijê me pêkhat. Encamên wê operasyonê hê jî berdewamin. Karê me yê piştî wê, giranî li dijî vê operasyonê meşîya.

Her weha di vê demê de dirêj ajohtina tamîrata avahîya me ya navendî jî, bandorek negatîf li karê me kir.

Di vê raporêde, xebatên me hemî nehatine nivîsandin, em neketine detayan, tenê me hinek xebat işaret kirine. Vê demêde xebatên me, giranî li welatên navendî yên Ewropa meşîyan. Her weha li Îskandînavya jî, xebatên giring pêkhatin. Di heman demêde, li Rusya jî xebat hatin meşandin, temsîla me li wî welatî heye, xebatên fermîkirina bûroya Rusya jî berdewamin. Her weha Bûroya Hevlêrê jî li gel karên xwe yên netewî, di heman demêde gelek xebatên karê derve jî meşandin. Li Emerîka jî hewldanê me hene, lê gelek lewazin.

Partîyên endamê KNK ê jî, ji alê xwe ve karê derve meşandin. Di vê çerçevêde li dijê zext û êrîşên rejîma Îran ê, teybetî li dijê îdaman dosya hatin amadekirin û kar hatin meşandin. Her weha li dijê zext û îşkenceyên rejîma rejîma Surî jî, gelek çalaki pêkhatin û kar hate meşandin. Teybetî li ser rewşa girtiyên siyasî yên ku di zîndanên Surî de dimîni, hate rawestan, dosya hatin amadejirin û hevdîtin hatin çêkirin.

Piştî hilbijartinên sala par yên parlamenta Ewropa, sêrîde dostên me yên Îtalyanî û gelek dostên me nehatin hilbijartin. Evê jî xebatên me yên Parlamentoya Ewropa hinek tengav kirin. Avakirina gruba dostan ya nû hinek wext girt. Grûba Çep disa destek da û pêşkêşî kir. Niha jî xebatên me yên xurtkirin û resmîkirina grûba dostan berdewam dikin.

Vê salê di Parlamentoya Ewropayê de Konferansek li ser Rewşa Elewîyan, Konferansek li ser Şideta Dijê Jinan û Konferansa 6. ya li Ser Çareserîya Pirsgirêka Kurdî hatin pêkanîn.

Dijî girtina DTP ê, dijî girtina endamên û rêveberên DTP ê û serokên belediyan, lî her cih û deverî xebat hatin meşandin. Di vê çerçevêde yek ji bo girtîyan, yek jî ji bo girtina DTP û serokên belediyan, du caran li Parlamenta Ewropa da, bi navê Pêşdeçûna Demokrasîyê, Mafên Bingehîn û Azadî li Turkîyê, du celseyên teybet hatin pêkanîn.

Xebatên Asambla Konseya Ewropa û Kongra Rêvebertîyên Herêmî yên Konseya Ewropa jî hatin şopandin. Li ser girtina serokên beledîyan, ji bo şandina hyetekî xebat hatin meşandin. Di vê çerçevede di navbera rojên 9-11 an yên meha Gulanê, heyetek ji Kongra Rêvertîyên Herêmî çû Ankara û Amed ê. Derdorên welaparêz jî navde, gelek kesan re axaftin û wê vî warî de raporekî amade bikin.

Li ser mijara guhertina cihê Birêz Abdullah Öcalan û girankirina tecrîda li ser wî, beşê karê derve yê xebat û çalakiyên li hember CPT yê, hatin meşandin.

Rûniştin û celseyên Komîsyona Mafên Mirovan yên Neteweyên Yekbûyî, li Cenevre yê hatin şopandin. Gelek nûnerên rêxxistinên sivil (NGO) re û nûnerên hinek welatan re hevdîtin hatin çêkirin. Her weha heyetek li ser navê me li Cenevre yê, tevlî Konferansa Dijê Mayînan ya Navnetewî bû.

Kongra Enternasyonala Sosyalîst ya ku li Montenegro pêkhatî de tevlîbûn çêbû, gelek hevdîtin hatin çêkirin û çûna sekretera jinan ya Enternasyonala Sosyalîst ji bo Amed ê, hate misogerkirin. Her weha tevlîbûna Kongra

Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê
Kurdistan National Congress
Congrès National du Kurdistan

KNK

Rue Jean Stas 41 1060 Bruxelles tel: 00 32 2 647 30 84 fax: 00 32 2 647 68 49
Homepage: www.kongrakurdistan.net ***e-mail:*** kongrakurdistan@gmail.com

Partîya Sosyalîstên Ewropa ya li Prag ê hate pêkanîn, gelek hevdîtîn hatin çêkirin û li ser girtina DTP ê daxunîya şermezarkirinê hate misogerkirin.

Amdekirina Guruba Aştiyê ya Ewropa da cih hate girtin, beşê karê derve hate şopandin û civîna çapenîyê hate çêkirin.

Li dij binçavkirin û girtina zarokan li Turkiyê, kampanyayek ji alê Bûroya Swîsre ve hate pêkanîn û li deverên din jî hate meşandin.

Şûraya Ziman û Perwerda Kurdî ya ku li Belçîka di Parlamenta Flamanan de hate çêkirin, beşê wê yê karê derve hate meşandin.

Lîsta Emerîka ya Narkotîkê ya ku sîyasetvanên Kurd weke qaçaqçîyên narkotîkê dide nîşankirin, dijê wê lîstê karên siyasî û huqoqî hatin meşandin.

Li Berlîn ê bi navê Nasnama Kurdî li Almanya konferansek, li Bonn ê bi navê Kurd û Huqoqa Ewropa konferansek navnetewî hatin çêkirin. Çi ji alê hevdîtinan, çi ji alê giranî danîna lî ser hilbijartinan eyaletan, çi ji alê pêkanîna reya giştî de li Almanya, gor salên berê xebatên baştîr hatin meşandin.

Di nava vê salêde, li Almanya, Fransa, Belçîka, Îngîltere, Îtalya, Îspanya, Siwîsre, Avûstûrya, Danîmarka, Siwûd û Norwec ê, hinek welatan carekî, hinek welatan çend caran bi heyetên ji welêt, di derdorên hukûmetan, parlamentoyan, partîyên siyasî, rêxistinên medenî û dostan re, gelek hevdîtinên cûrbecûr hatin çêkirin. Li van welatan gelek panel û civînên gel hatin pêkanîn. Li ser pirsgirêka Kurdî û pêşdeçûnên rojane, li parlamentoyan pêşkêşkirina gelek pirsan hatin misogerkirin.

Li Qibris ê û li Başûrê Afrîka, di asta hukumetan de hevdîtin hatin çêkirin. Ji bo dema pêş zemîna kar hate amadekirin.

Bi navê Çareserîya Pirsgirêka Kurdî, di Senatoya Fransa yê de konferansek hate çêkirin.

Arîkarîya ku ev çend salin ji hêla hinek sazîyên medenî yên Marsîlya ve ji bo Qempa Mexmûr tê rêkirin, isal jî hate organîzekirin.

Di asta welêt de, Bi komîteyên dostan yên Fransa re civîn hate pêkanîn, plansazî hate çêkirin û koordînasyona dostan hate avakirin. Cara pêşî bi hevre li Parîs, Marsîlya, Nantes û Rennes ê, çalakîyên hevbeş hatin çêkirin.

Kampanya ku bi navê Ji Bo Çareserîya Pirsgirêka Kurdî Divê PKK Ji Lîsta Terorê Bê Derxistin, ku ji alê komîtên dostan ve tê meşandin, hate berdewamkirin.

Kongra Gelên Bê Dewlet ya ku bi navê Mafên Kolektîf yên Gelan xwe rêxistin dike û ku kongra avakirinê li Barselona yê pêkhat, ji alê me ve tevlîbûn çêbû û hevalekî me jî, ji bo rêveberîya vê rêxistinê hate hilbijartin.

Di Bîenanala Venezîya de ku şeş mehan berdewam dike, hem di vekirinêde hem jî di berdewamîyêde, bi çalkîyên çandî, tevlîbûnek xurt hate pêkanîn.

Di 12.11.2010 an de li Venezîya, bi navê Di Pirsgirêka Kurdî de Lêgerînên Çareserîyê û Tecrûba Navnetewî, konferansek navnetewî hate çêkirin.

Di rojên 11-12.10.2010 an de, civîna Koordînasyona Dostên Îtalyanî hate çêkirin. Di civînêde li ser kêmahî û pirsgirêkên rêxistinî hate rawestan û plansazîyek hate çêkirin.

Li Îtalaya, çerçeva karên piştgirtina beledîyên Kurdistan ê de, ji bo projê Geşkirina Wan ê, ji bo projê Ava Qilaban ê, ji bo projê Sûka Sergirtî ya Culemêrg ê, kar hatin meşandin.

Li Îngîltere, ne tenê Parlamento, Kamara Lordan, partîyên siyasî û rêxistinên medenî yên merkezî, her weha di heman demêde li Îskoçya, Li Welsh û li Bakûrê Îrlanda jî, hevdîtinên pir alî hatin pêkanîn.

Li Îngîltere, bi daxwaza ku PKK ji lîsteya terorê bê derxistin, ji alê 28 parlamenteran ve pirsek hate amadekirin û pêşkêşê parlamentoyê hate kirin. Her weha dîsa li Îngîltere, bi daxwaza tecrîda li ser Serok Apo bê rakirin û rewşa wî bê asankirin, ji alê 18 parlamenteran ve pirsek hate amadekirin û pêşkêşê parlamentoyê hate kirin. Em dixwazin li welatên din jî, karên weke van bêne çêkirin û me ev ji hevalên xwe xwestine.

Ji Fransa, İspanya, Almanya, İtalya, İngiltere, Belçika, Hollanda, Swîsre, Avusturya û ji Welatên Îskandinavya, heyetên Newrozê hatin amadekirin û çûne Kurdistan ê.

Di vê demêde, li Belçîka civînên koordînasyona dostan bi perîyodîk hatin çêkirin. Piştî operasyona li ser me, me giranîya xwe da Belçîka û gelek astan hevdîtin hatin pêkanîn. Lê têrê nakin, divê bê navber ev kar bêne xurtkirin.

Ji bo helwesta li dijê vê operasyonê, ji bo stratejîyek hevbeş, ji bo dîyalog û koordînasyona navbera avukatan, di roja 24.04.2010 an de li Brûksel ê, bi beşdarbûna avukatên ji Belçîka, Almanya, Fransa, Îtalya û Turkîyê, li gel avûkatên ku daeweyên me teqîp dikin, civînek berfireh hate pêkanîn.

Di vê demêde, civînên komîta amadekar yên Forma Civakî ya Ewropa yên ku li Berlîn, Atîna û Vîyan yê pêkhatîn, ji alê me ve tevlîbûn çêbû û ji bo tevlîbûna dostan ya ji bo civîna Forma Civakî ya Mezopotamya ya Amedê, kar hatin meşandin.

Vê demêde, xebatên enformasyonê hatin meşandin, bûltenên hefteyî yên Îngîlîzî hatin derxistin, ji bo hemî boyerên giring dosya hatin amadekirin û malper hatin nûkirin.

Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê
Kurdistan National Congress
Congrès National du Kurdistan

KNK

Rue Jean Stas 41 1060 Bruxelles tel: 00 32 2 647 30 84 fax: 00 32 2 647 68 49
Homepage: www.kongrakurdistan.net ***e-mail:*** kongrakurdistan@gmail.com

Rapora Komîsyona Karên Netewi
Ji bo Kombûna Mezin [Civata 10.]
23 – 24 Gulan 2010, Bruksel

Pevajoya saleke kar u xebata me, ligel KNKe u ligel Gel bu u bi awayeki xurt berdewam kir. Di ve pevajoye de, bi parti, rexisitn, saziyen sifil, komele, bi rew;enbiran re, bi haraketen gel re tekili hatin danin u hevditin pekhatin. Di van hevditin u tekiliyan de, rewsa dawi hate axaftin u nirxandin. D partike de ji me bi hevv re haraket kir. Di karen rojane u salene de me cih girt u hevkariyek dilsoz mesand. Ji aliye din ve, me tekili bi kesyaetiyen parceyen din re ji dani u lis er pesketinen rojane u yekiteya neteweyi a demokratik de karuxebat kirina.

Bi taybeti di xwediderkeitna nirx u piroziyen Haraketa me de, u di derbare siyasetn hezn degirekr ku siyaseten wek ~vekirine~ kirine pratike, li din bingeha xwe de tesfioyekirin e, hate axaftin u gotin. Ji bo di nava gel de ev siyaseten gemari werin de;fire kirin kar u xebar haitn mesandin. Ji aliye din ve peskeitnen li Basure Kurdistane hatin sopandin u di her firsete de nirxandin haitn kirin u bi balkesi lis er tehlokeyen xeternak u metirsni hate rawestandin.

Beguman encama van nirxanbdin u guftugoyan ji ba; bu. Di ve carcove de u di her firsete de Yekitiya Neteweyi a demokratik hate axaftin u giringiya we hate ziman. Hem beri ku her kesi u her organizasyone ev xal giirng dit u pediviya we ani ziman ji, encameke li gori deme dernekete hole.

Ji aliye din ve, lis er eriskeriyen dewleta Irane u zext u zroa *rane ya lis er gele me hate axaftin.* LI ser tekiliyen bi muxalefeta Irane re u pekanina hevakriyeke demokratik ya li diji rejima Irane hate axaftin. Di mijaren dardekirinan de, helwesta cihane ya bedeng u pdiviya hevgitina demokratik ya bi gelen din hezen demokratikre hare axaftin.

Li ser Tikriye i siyasetn gemari u demgaojik ji hate rawestandin u nierxandin haitn kirin. Pediviya hevkari u dijbeirya yekeniye hate axaftin. Di encame hevkari u paltformen hevbes, eniya demokratik wek ditin u ereniya hevbes derkete pes.

Li gori Biryara Konseya Revebira ya dawi, li Elmanya 4 civin, hatin organize kirin. Ev civin li Berlin,Hamburg,Stututgart u Kölne pekhaitn. Di tevahiya civinan de pdiviya berfireh kirin u bihez kirina KNKe hate axaftin. Di cvinan teva de, pewistiya kar[xebaten KNKe yeb bi plan u program hate axaftin. Di ve carcove de, pedivi u giringiya pekhatina Konferansa Neteweyi, beyi ku dereng bimine u ne tene partiyen siyasai, rexisitnen civaki, kesayetiyen serbixwe u pe;negen civake ji di dibin siwana KNKe de cih bigirin.

Siyaseta KNKe ya netweyi were pesxistin u wek Yekitiya Netweyi ji derbikeve pes. BI ve pekhaitne re, bi Haraketa Azadiya Kurd re. Eniya diplomasi u eniya civaka demokratik pesbixe. Beguman di van karuxebatan de we lobi u xebaten tekili u hevditnan bi xurti ben kirin. Di aliye kultur u edbeiyate de karuxebat bene kirin u KNKe bi komisyon u heza xwe pesengiya pe;ketina ziman, kultur u edebiyaet bike. Ev karuxebat ji wek daxwaz u pesniyaz ji derketin pes.

Di van civinan de, ji her parceyan kesayeti, rewsenbir u niviskar amade bun.

Wek Parti u rexistin, Haraketa Goran, PDK, YNK, Partiya Komunist a Bakur, Komkar, Harketa Jinen Ba;ure Kurdistane, Inisiyatifa Dersime, Ji bili we, ODK, YNK, Haraketa Goran, yek bi yek hate axaftin u hinek ji kesayetiyen Haraketa Goran, YNK dixwaizn ku bibin endame KNK.

Komita Karên Netewi
22.05.2010, Bruksel

Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê
Kurdistan National Congress
Congrès National du Kurdistan

KNK

Rue Jean Stas 41 1060 Bruxelles tel: 00 32 2 647 30 84 fax: 00 32 2 647 68 49
Homepage: www.kongrakurdistan.net ***e-mail:*** kongrakurdistan@gmail.com

Rapora Komîsyona Jinan
Ji bo Kombûna Mezin [Civata 10.]
23 – 24 Gulan 2010, Bruksel

Bi salan e li çar aliyên Kurdistanê jinên Kurd di nava jiyana civakê de ji bo vîna xwe derxe holê roleke girîng lîstiye û tevlîbûneke aktîf daye çekirin. Li Kurdistanê pirsgirêka azadîya jinê her ku diçe dibe pisgireka civakê bi xwe. Dewletên dagîrker yên ku bingehê xwe ji desthilatdariya pênç hezar salan digirin, dixwazin bi kevneşopiyên di nava civakê de berxwedan û vîna gelê Kurd li gora berjewendiyên xwe bi kar bînin. Ji milekî ve bi riya çapemenî, sînama û dîziyan dixwazin rûmeta me ya neteweyî bişkînin û ji milekî din vê jî teşwîq dikin. Bi taybetî dewleta Tirk di vî warî de her ku diçe siyaseta xwe ya şerê qirêj pêş dixe û bi vê rê bi sînor namîne, di qada navneteweyî de ji bi heman rengî siyaseta xwe ya qirêj di çapemeniya cîhanê de îmajeke wisa didin diyarkirin ku Kurd paşdemayî ne. Bê guman pirsgiraka jinê ji pirsgirêka naveteweyî jî derbas bûye. Hê jî li nava gelek civak û dewletan ev pirsgirêk çareser nekirinê û ev pirsgirek bûye pirsgirêka sedsalan ya sereke. Divê em weke KNK di dema pêş de li dijî polîtîkayên hêzên deshilatdar derkevin û ji bo çareserkirina pirsgirêka jin û civakê bi rengeki xurt xwedî lê derkevin

Li bakurê Kurdistanê di van salên dawî de serkeftina di warê azadiya jinê de li her çar parçeyên Kurdîstanê belav bûye û gihîştiye asteke bilind. Jinên Kurd di warê siyasî, çandî, çapemenî û rexistina civaka medenî de serkeftinên bi dest xistîn, ji bo demokratîkbûna civaka Kurdistanê xwedî wateyeke jîyanî ne. Bingahê van serkeftinan konferansa jinan bû, konferansa neteweyî ya bi durişma "di pêşîvekirina demokrasiye de rola jinê" ya li Amedê di navbera 24-25ê Nîsanê de hatî darxistin. Em weke komisyona jinan a KNKê konferansa jinan a neteweyî ya li Amedê hatî lidarxistin silav dikin û em hevîdar in ku ji bo avakirina yekîtiya neteweyî bibe bingehekî esasî. Yek ji biryarên di konferansa neteweyî de hatîn girtin ew e ku 2. Konferansa jinan li Hewlêrê bê lidarxistin. Em hêvî dikin sazî û rexistinen jinan tev piştgiriyê bidinê.

Kar û xebata komisyona jinan a KNKê

Komisyonê ji dervayî 6 mehên dawî, bi rengeki sîstematîk civînên xwe dane meşandin. Di destpêkê de, ji ber ku berdevka komisyonê tinebû valatî çêbû lê di demeke kin de ev pirsgirêk hat çareserkirin û bi civîneke fireh plansaziya salekê hat amadekirin.

Li gora vê, bi pêmana 8ê Adarê roja jinên kedkar a cîhanê, 25ê Mijdarê roja têkoşîna şideta li ser jinê ji bo çapemenîyê daxuyanî hatin dayin û ji bo piştgiriya kampanyaya "em jin in ne namûsa ti kesî ne namusa me azadiya me ye" ya ji aliyê tevgera jinên Kurd ve hatî destpêkirin, li Swêdê semînerek ji bo jinan hat dayîn û derbarê vê kampanyayê de jî ji bo çapemeniyê daxuyanî hat dayîn.

Di Nîsan û Gulana 2009 de heyeta KNKê ku ji bo hin hevdîtin çûbû başûrê Kurdistanê, yek ji endama komisyona jinan jî di navê de cih girtibû û li başûrê Kurdîstanê bi gelêk sazî û kesayetên jin re hevdîtin pek anîn. Û ji bo pêşxistina diyaloga nevbera yekîtîyên jinan bû gaveke erênî. Weke komisyon ew konferansa jinan a li Amedê hatî lidarxistin, hem di alîye amadekariyan, hem di aliyê tevlîbûnê de piştgirî jê re hat dayîn û 3 endamên komîsyonê beşdarî konferansê bûn.

Di dema civata giştî de bi devlîbûna endamên komiyona jinan wê civînek bê liderxistin û plansaziya salê bê amadekirin.

Komisyona Jinan
22.05.2010, Bruksel

Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê
Kurdistan National Congress
Congrès National du Kurdistan

KNK

Rue Jean Stas 41 1060 Bruxelles tel: 00 32 2 647 30 84 fax: 00 32 2 647 68 49
Homepage: www.kongrakurdistan.net ***e-mail:*** kongrakurdistan@gmail.com

Rapora Komisyona Ziman, Perwerde, Kultur û Hunerê Ji bo Kombûna Mezin [Civata 10.] 23 – 24 Gulan 2010, Bruksel

Komisyona me rapora xwe ya berfireh ya 2009ê di kombûna 20ê Gulana 2009ê da pêşkêşî we kiribû û hatibû erêkirin. Li goreyî wê raporê planê xebatê jî hatibû kivş kirin ku xala herî giring komkirina "Şûraya Ziman û Perwerdeya Kurdî" û herweha komkirina "Sempozyuma Muzîka Kurdî" bû. Komisyona me "Şûraya Ziman û Perwerdeya Kurdî" herwekî plankirî di 5-6ê Teşrîn-Mijdara 2009ê da li salona Parlementa Flaman ya Brukselê kom kir. Partnerên vê xebatê Instîtuta Kurd li Elmanya, Înstîtuya Kurdî ya Stockholmê, Înstîtuya Kurdî ya Stanbolê, Enstîtuya Kurdî ya Brukselê û TZP Kurdî bûn. Helbet Partîya Flaman jî destek da vê xebatê. Terkîba "Şûrayê" seranserîya Kurdistanê û dîasporaya Kurdî bû. Ji Kurdistana Federal beşdarî kêm bû lê eve bi timamî ji ber astengîya vîzeyan bû.

Ji bilî vê astenga teknîkî beşdarîyeke têrker pêkhat di "Şûra"yê da. "Şûra" ji alîyê terkîba bisporan û programa xwe ve serkevtî derbaz bû. Amanca "Şûra"yê belavkirina deklarasyoneke xurt û destnîşankirina pêdivîya "Organa Şêwira Ziman" bû. Di vî warî da deklarasyoneke bi naverokeke xurt ji teref hemû beşdaran ve hate qebûl kirin û bi rêya medyayê ji bo bîr û rehîya Kurdistanê hate belav kirin. [*Deklarasyon li jêr e.*] Beşdarên "Şûra"yê bi yêkdengî wezîfeya pêkînana "Şêwira Ziman û Perwedeya Kurdî" û tesbîtkirina navan da "Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya KNKye". Komisyona me bi vê amancê seradanîya Kurdistana Federal kir û hem digel Akademîya Kurdî ya Hewlêrê û Unîversîteyên Duhok û Hewlêrê danûstandin pêkîna, hem jî digel KZPya KCKyê rûnişt û pirsa pêkînana "Şêwira Ziman û Perwerdeya Kurdî" gotûbêj kir. Komisyona me herweha digel KZPya KCKyê protokoleke li ser hemû pirs û pirsgirêkên ziman û perwerdeya Kurdî pêkîna û zemînê têkilîyeke yêkser hate danîn. Di hevdîtina 22yê Çileya 2010ê da protokoleke bi vî rengî hate formûle kirin: *22 Çile 2010, Eynî, Hewlêr + Ranya Seet: 10:00: Seradanîya Ranyayê / Seet: 19:00 Kombûna digel KZP-KCKyê li "Warên Parastinê yên Medyayê"/ Ji KZP-KCKyê: Batûfa + Dildar + Nûjîyan + Çigdem/ Ji KNKyê: Rojan Hazim + Adem Uzun + Nasir Resûlî*

Li goreyî protokola di navbeyna KZP-KNK û KZP-KCKyê da biryara prensîbî: Di navbeyna KZP-KCK û KZP-KNKyê da koordînasyoneke dîrekt (yêkser) pêkhat. Li Ewrûpayê dê bi KZPya CDKyê ra xebat bête kirin. Mîsyonê polîtîka neteweyî ya di warê ziman û perwerdeyê da didine KZPya KNKyê… Cejna Zimanê Kurdî dê bi programeke hevpar û bi koordîneyeke yêkgirtî bête pîroz kirin.

Li goreyî vê prokolê, "Cejna Zimanê Kurdî" îsal bi rengekî berfireh hate pîroz kirin. Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya KNKyê di vî warî da rola xwe ya pêşeng û koordînatîv bi cih îna û "Cejna Zimanê Kurdî" dîyarî neteweyê Kurd kir. Êdî rêxistinên pratîkal li seranserê Kurdistanê û dîasporayê pîroz dikin. Cejna Zimanê Kurdî edî bû tradisyon û rûnişt, cihê xwe girt û ji alîyê xelkê Kurd ve qebûlîyek peyda kir. Komisyona me ji ber pêkînana vî karê neteweyî serbilind û dilşa ye.

Komisyona me li goreyî biryara "Şûraya Ziman û Perwerdeya Kurdî" digel Akademîya Kurdî li Hewlêrê rûnişt û li ser pêkînana "Konferansa Ziman" li Hewlêrê û herweha li ser pêkînana "Şêwira Ziman" rawesta. Di navbeyna KZPya KNKyê û Akademîya Kurdî da li hev hatineke prensîbî pêkhat ku "Konferans" di payîza îsal [2010] da li Kurdistana Federal çêbe. Akademîya Kurdî li ser vê yêkê "proje" ji me xwast. Me jî ev proje bi rêya buroya KNKyê ya Hewlêrê ji wan ra rêkir. Em vê gavê li hêvîya bersiva wan in. * *[Proje li jêr e.]* Me proje herwisa ji bo KZPya KCKyê jî rêkir ku ew jî di vî warî da digel me hemfikir in. Komisyona me bi giringî li ser pirsê disekine.

KZPya KCKyê jî berî "Konferansa Ziman ya li Kurdistan Federal" dê "konferanseke ziman ya navxweyî" pêkbîne û em jî hatine agahdar kirin û raporek jî ji komisyona me hatîye xwastin. Lê komisyona me dê daxwazê ji wan bike ku bi delegasyonekê beşdarî wê konferansa navxweyî bibin û dîtin û pêşniyarên komisyona me pêşkêşî konferansa navxweyî bikin. Ev konferansa navxweyî tête fikirîn ku berî "Konferansa Ziman ya li Kurdistana Federal" bête kom kirin.

Komisyona me piştî van herdu konferansa û şêwira bi KZPya KCKyê û Akademîya Kurdî ya Hewlêrê ra, dixwaze navên ku dê di "Şêwira Zimanê Kurdî" da cih bigirin tesbît bike û "Şêwira Zimanê Kurdî" di pratîkê da bide dest pê kirin.Li ser talankirina muzîka Kurdî jî di kombûna 4ê Nisana 2009ê da biryara sempozyumekê hatibû standin. Xala dehemîn ya biryaran wisa bû: *[10. Sempozyûmek li ser talankirina muzîka Kurdî li Köln anjî Brukselê bête kom kirin.a.Mamosta Emer dê bi vê yêkê ve mijûl bibe.]*"Sempozyuma Muzîka Kurdî" heta nihe jî kom nebûye. Esasen Mamosta Emer ji bo vî karî hatibû wezîfedar kirin ku digel Akademîya Hunera Kurdî organîze bike û bîne cih. Mixabin ku ev kare heta nihe jî nehatîye kirin.Komisyona me dê xebata xwe ya tesbîtkirina perspektîv û polîtîka neteweyî ya di warê ziman, perwerde, kultur, folklor û hunerê da bidomîne.

Digel rêz û silavên germ pêşkêşî Konseya Rêvebir dikin.

Komisyona Ziman û Perwerde, Kultur û Hunerê ya KNKyê
22 .05.2010, Bruksel